Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :428 nameronahi@gmail.com 6- Tebax - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Bihûşta xwezayê: Gola Nemrûdê





Li cîhanê duyemîn gola kortal a mezintirîn Gola Nemrûd a li Tetwanê ye. Gol bi xweşikiya xwe ya xwezayî û rengê xwe wek bihûştekê ye û wek newazeya xwezayî tê binavkirin. Tê gotin ava golê her sal kêmtir dibe. Duyemîn gola kotral a mezintîrîn a cîhanê Nemrûd e û li sêgoşeya navçeyên Tetwan, Xelat û Norşînê yên Bedlîsê ye. Gola Nemrûdê bi bedewiya xwe ya xwezayî û ava wê ya derman tê nasîn. Ji ber germa zêde mirov diherikin ser golê û xwe li qeraxê wê yên hênik dikişînin.

## NEWAZEYA XWEZAYÊ YE

Li gorî zanyarên erdnîgarî du teqînên mezin pêk hatine û Nemrûd teşeya xwe ji wir digire. Ji Nemrûdê re "Bihûşta Îskender" jî tê gotin. Vê yekê jî dispêrên dema Qralê Mezin ê Makedonyayê Îskender diçe sefera rojhilat a Hîndîstanê li Gola Nemrûdê bicih dibe. Beriya Zayînê (B.Z.) di sala 2100'an de Nemrûd wek havîngeha qralê Babîlê jî tê nasîn. Tê gotin Nemrûd newazeya xwe ya xwezayê ji vir digire.
Qada golê ji 13 kîlo mîtroyan pêk tê. Gol bi xweşikiya xwe dike ku mirov ji xwe re matmayî bimînin. Gol 2 hezar û 943 mîtro bilind e.

## RENGÊ WÊ BALA MIROVAN DIKIŞÎNE



Li Nemrûdê 5 gol hene û ji yek jê jî Gola Mezin e. Gol bi rengê xwe yê hêşîn mirovan sermest dike. Turîst jê re dibêjin "Gola Hêşîn." Gol ji ava baran û berfê pêk tê. Cihê herî kûr ê golê 175 mîtro ye. Li gel Gola Hêşîn jî li Gola Krater a Nemrûtê ava germ jî heye rengê wê kesk dibe. Di heman demê de gol



wezîfeya avgermê jî dibîne û li gorî mirovan ava wê şîfa ye. Mirov ji bo şîfaya golê diçin serdanê. Wêneger jî jî diçin golê û wêneyên gol û xwezaya wê dikişînin.

## AVA WÊ DERMAN E



Yek ji balkêşiyên li golê jî Bacayên Buhar û Şikefta Buz e. Şikefta Buzê di bin tatan de hewa hênik dide û wezîfeya klîmayê dike û Bacayên Buharê jî hewa germ derdixe derve. Tê bawerkirin ku bacayên buharê ji nexweşîyên mîna astim, romatizma û êşa monikan re baş e. Bi salan e mirovên bi van nexweşînan dijîn diçin golê û sûdê jê werdigirin.



## AV KÊM DIBE

Musa Selgî yê 30 sal e li gola kraterê çayê difiroşe têkildarî golê wiha got: "Vê derê qada sît îlan kirin. Mirov bi armanca seyranê tên vir. Herî zêde di navbera salên 1987-1990'an de turîst hatin serdana vir. Di nava demê de turîst nehatin. Niha pir kêm turîst tên serdanê. Di nava 30 salan de ava golê kêm bû. Sedemê vê yekê jî ew e buharbûna ava di bin de ye. Her wiha ava Gola Mezin jî kêm dibe. Îsal ava germ jî nîne. Dema ava golê kêm dibe, av jî germ nabe. Berê traktor tune bû mirov bi gayan dihatin vir. Niha li gel rê jî hatiye çêkirin, lê kes nayê serdanê. Hatin gelek kêm e. Niha serbestir e lê kes nayê. Li gel av bi şîfaye jî dîsa kes nayê. Êdî tehma vir jî nemaye." *...MA*


Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 428 6- Tebax- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

Hesabên kesî li Sûriyê pêknayê *R-4*

Aloziya Têkeliyên DYA-Tirkiye -2- *R-5*

# LI DIJÎ ZEXT Û TECRÎDÊ RABIN

***Hevseroktiya Konseya Rêveber a KCK'ê destnîşan kir ku ji 5'ê Nîsana 2015'an û vir ve li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tecrîdeke giran heye û got, "Tecrîd û zexta li ser Rêbertî tecrîd û zexta li ser gelê Kurd e. Têkoşîna dijî tecrîdê, têkoşîna li dijî polîtîkayên şer û faşîzmê ye."***




KCK'ê di daxuyaniya xwe de wiha got, "'Mirov çawa nêzîkî rêberê civakekê bibe mirov wiha nêzî wê civakî jî dibe. Nêzîkatiya li Rêbertiyê nêzîkatiya li gel e. Tecrîd û zexta li ser Rêbertî tecrîd û zexta li ser gelê Kurd e. Nêzîkatiya li Rêbertî nêzîkatiya li hêzên demokrasiyê ye. Tecrîd û politikaya zextê ya li Îmraliyê tecrîd û politikaya zextê ya li ser hemû hêzên demokrasiyê ye."


KCK'ê diyar kir ku CPT û Konseya Ewropayê qirkirina dewleta Tirk a li ser Kurdan û tecrîda giran a li Îmraliyê dipejirînin û wiha dewam kir, "CPT û Konseya Ewropa bi nêzîkatiya xwe zextên li ser gelê Kurd meşrû dikin û tecrîd, zexta li Îmraliyê normalîze dikin." KCK'ê bang li hêzên demokrasiyê kir ku li dijî tecrîda li ser Rêber Ocalan rabin û li dijî faşîzmê têkoşînê bikin." *R-4*

## Kongreya Star ji bo jinan bang kir



Rêxistina Kongreya Star a herêma Dêrikê derbare kiryarên çete û leşkerên artêşa tirk a dagirker de daxuyanî da û bang li rêxistinên navnetewî hat kirin ku komîteyeke lêpirsînê derbarê Efrînê de ava bikin, kiryarên dewleta Tirk bi belge bikin û tundiya li ser jinan rawestînin. *R-3*

## 30 sal di zîndanê de ma, hat berdan



Santî Potros ku yek ji lîderên ETA'yê ye piştî ku 30 sal di girtîgehê de ma hat berdan. Ji ber êrîşa di Hezîrana 1987'an de a li Barselonayê ya ku 21 kes miribûn, Potros dihat sûcdarkirin. Potros di sala 1987'an de li Fransayê hatibû girtin û di sala 2000'an de radestî Îspanyayê hatibû kirin. *R-2*

## TEV-DEM'ê rêze civîn da destpêkirin

Rêveberiya Xweseriya Demokratîk û Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM'ê ji bo rewşa siyasî ya dawîn bi gel re binirxînin li kantona Kobanê rêze civîn dane destpêkirin. Civîna yekemîn li navçeya Çelebiyê hate lidarxistin. Bi dehan welatî beşdarî civînê bûn. Di civînê de rewşa bakurê Sûriyê û êrîşên dagirkeriyê hatin nirxandin. *R-5*

## Jina Efrînî çeteyê qatil kuşt



Li Efrînê çeteyên dagirker û kujer her diçe zext û zilma li ser gel zêdetir dikin. Hersa gelê Efrînê jî li hember kiryarên dagirkeran mezintir dibe. Hat ragihandin hevjîna kesê ku ji aliyê çeteyan de hat qetilkirin, bilokek ji jor de avêt çeteyek kuşt. Hat gotin ku çeteyan ew jin revandine û nayê zanîn birine kî derê. *R-2*

## Çete ola îslamê li Êzidiyan ferz dikin

Leşker û çeteyên Tirkiyê yên dagirker kiryarên xwe yên hovane li ser gelê Efrînê didomînin. Hat ragihandin ku dagirker welatiyên ji gundê Basûfanê yê Şêrawa neçar dikin ku zarokên xwe bişînin mizfetê da ku perwerdeyên olî bibînin. Gundiyên ku ev kiryar qebûl nekirin rastî ji aliyê dagirkeran ve hatin desteserkirin. *R-2*

## Ji bo parastina gel em herdem amade ne




Fermandariya Giştî ya YPG'ê têkildarî komkujiya çeteyên DAIŞ'ê ya 25'ê Tîrmehê li ser gelê Suweyda ku têde 250 kes hatibû qetilkirin daxuyaniyek belav kir û sersaxî ji gelê Dûrzî re xwest û êrîş şermezar kir. YPG'ê got, "Weke hêzên parastinê wê têkoşîna me li hember terora DAIŞ dewam bike. Gelê Durzî jî di nav de em ji bo parastina gel her dem amade ne." *R-5*

## Li Efrînê wê çalakî zêde bibin



Fermandarê giştî yê YPG'ê Sîpan Hemo diyar kir ew amade ne hêzeke xwe bişînin Siwêdayê da ku bajar ji terorê paqij bikin. Hemo her wiha desnîşan kir ku çalakiyên wan ên li Efrînê li dijî leşker û çeteyên dagirker yên Tirkiyê berdewam dikin û got, "Ev çalakî wê zêde bibin." *R-5*

## Astengkirina Tevgera Azadî cihê fikaran e



Biryar e ku di 30'ê Îlonê de hilbijartinên dema 5'an a Parlamentoya Başûrê Kurdistanê pêk were. Endamê Serokatiya Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê Hisên Kerkûkê diyar kir ku dûrxistina wan a ji hilbijartinê biryareke PDK'ê ya siyasî ye. Kerkûkî got, "Ji derveyî Nifşên Nû ti aliyê siyasî helweset li dijî vê biryarê nîşan nedaye." *R-4*

## Agahî ji endamê HDP'ê nayê girtin



Li Hewlêr, Dihok û Zaxoyê zextên asayişa PDK'ê yên li hember welatiyên ji Bakurê Kurdistanê yên li van herêman dijîn zêde bûne. Endamê HDP'ê Mehmet Vefa Koçakli li ser banga asayîşa Hewlêrê çû asayîşê û ev 6 roj in agahî jê nayê girtin. *R-2*

## Li Îranê çalakî berbelav dibin

Li Îranê çalakiyên gel yên ji ber şertên giran yên jiyanê û gendeliyê her ku diçe berbelav dibe. Xwepêşandanên li Îsfehanê destpêkirî belavî bajarên din jî bûn. Jin pêşengiyê ji xwepêşandanre dikin. Hat ragihandin bi dehan çalakger ji aliyê rêjîma Îranê de hatine girtin. *R-2*

# Jina Efrînî çeteyê qatil kuşt

*Li Efrînê çeteyên dagirker û kujer her diçe zext û zilma li ser gel zêdetir dikin. Hersa gelê Efrînê jî li hember kiryarên dagirkeran mezintir dibe. Hat ragihandin hevjîna kesê ku ji aliyê çeteyan de hat qetilkirin, bilokek ji jor de avêt çeteyek kuşt. Hat gotin ku çeteyan ew jin revandine û nayê zanîn birine kî derê.*

Zilm û zordariya dagirkeran li Efrînê bê navber didome.
Çete û leşkerên dagirker yên Tirk rojane kiryarên xwe yên hovane li ser gel zêde dikin.
Li hember van kiryarên dagirkeran jî hêrsa gel her diçe mezintir dibe.
Artêşa tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê welatiyek Efrînî qetil kirin û hevjîna wî ji bo tola hevserê xwe çeteyek kuşt.
Çavkaniyek ji kantona Efrînê ragihand ku çeteyên koma “El-Hemzat” a girêdayî artêşa tirk a dagirker bi ser mala welatiyek ereb li nêzî parka taxa El-Eşerefiyê girtin û ew kuştin.
Her wiha hat diyar kirin ku hevjina kesê hat qetilkirin ji bo tola hevserê xwe bilokek ji jor de avêt çeteyek û hate kuştin.
Heman çavkanî tekez kir çeteyên artêşa dagirker piştî buyerê tax girtin û derketina derve li şêniyan qedexe kirin û jina ku çete kuşt revandin û ber bi cihek nediyar ve birin…
*ANHA*



## Agahî ji endamê HDP’ê nayê girtin



Endamê HDP’ê Mehmet Vefa Koçakli li ser banga asayîşa Hewlêrê çû asayîşê û ev 5 roj in agahî jê nayê girtin.

Li gorî nûçeya RojNewsê, Ji 1’ê Tebaxê ve agahî ji endamê Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Mehmet Vefa Koçakli yê li Hewlêrê dijî, nayê girtin. Koçakli nûnertiya HDP’ê agahdar kiribû û diyar kiribû ku asayişa Raperîn a Hewlêrê gazî wî kirin e. Lê ji roja ku çûye asyîşê heya niha agahî jê nayê girtin.
Endamê Nûnertiya HDP’ê li Herêma Kurdistanê Abid Îke agahî da Rojnewsê û diyar kir ku ji roja Koçaklî çûyî asayîşê ve agahî jê nayê girtin.

### ASAYÎŞ Û PDK AGAHÎ NADIN

Îke diyar kir çend caran Koçakli ji asayîşa taxa Raperîn a Hewlêrê û asayîşa Hewlêrê ya giştî pirs kirine lê, herdu asayîşan jî ti agahî derbarê endamê wan de ne dane û red dikin ku hatiye destgîrkirin.
Abid Îke her wiha diyar kir ku piştî asayîşê ew bi rayedarên PDK’ê re jî ketine peywendiyê û derbarê rewşa Koçakli de agahî xwestine. Tevî ku rayedarên PDK’ê gotine ew ê di vê derbarê de agahdar bikin jî heya niha ti zanyariyek ne dane.
Nûnerê HDP’ê Îke dazanîn ku li Hewlêr, Dihok û Zaxoyê zextên asayişê yên li hember endam û welatiyên ji Bakurê Kurdistanê yên li van herêman dijîn zêde bûne.

## 30 sal bû di zîndanê de bû, hat berdan

Yek ji serokê ETA’yê Santî Potros (Santîago Arrospîde Sarasola) duh sibehê ji girtîgehê derket.
Santî Potros ê ku 30 sal in di girtîgehê de ye, tê îddîakirin ku çalakiya herî xedara a ETA’yê kiriye. Potros duh sibehê ji girtîgeha Topasê derket.
Sê kes hatin pêşiya Santî Potros û Potros li wesayîta van sê kesan siwar bû. Tu daxuyanî ji çapemeniyê re nehat kirin.
Ji bo Potros 3000 sal ceza dihat xwestin.
Ji ber êrîşa di Hezîrana 1987’an de a li Barselonayê ya ku 21 kes miribûn, Potros dihat sûcdarkirin.




Potros di sala 1987’an de li Fransayê hatibû girtin û di sala 2000’an de radestî Îspanyayê hatibû kirin.

## Li Colemêrgê 2 leşkerên Tirk hatin kuştin



Gerîlayên HPG’ê li navçeya Çelê ya Colemêrgê li dijî artêşa Tirk a dagirker çalakî lidarxist. Di çalakiyê de 2 leşkerên Tirk hatin kuştin.

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê daxuyaniyeke nivîskî weşand û agahiyên çalakiya 4’ê Tebaxê ya li navçeya Çelê ya Colemêrgê parve kir. Di çalakiyê de 2 leşkerên Tirk hatin kuştin.
Daxuyaniya HPG’ê wiha ye;
“Di çarçoweya Pêngava Şoreşger a Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de, hêzên me 4’ê Tebaxê saet 10.00’an li girê Koordîne yê navçeya Çelê ya Colemêrgê li dijî leşkerên TC’ê ya dagirker ku bicih bûbûn çalakiyek lidarxist. Di çalakiyê de derbeke serkeftî li kozikên dijmin hate xistin û 2 leşkerên dijmin hatin kuştin.”

## Li Îranê çalakî berbelav dibin

Li bajarê Îsfehan yê Îranê çalakiyên ku li dijî rewşa giran a jiyanê, gendelî û qûtbûna ceyran û avê dest pê kirin, her ku diçe berbelav dibe.
Xwepêşandanên li Îsfehanê destpêkirî belavî bajarên din jî bûn. Gel zextên rejîmê, rewşa giran a jiyanê, qûtbûna av û ceyranê protesto dikin.
Xwepêşandanên ji aliyê esnafan destpêkirî, ajokarên wesayîtan û karker jî piştgiriyê dikin.
Pêşengê xwepêşandanên li Îranê jin in. Diyar bû li Kerecê piştî çalakiyên protestoyê pasdarên Îranê qedexeya derketina derve îlan kirine. Li aliyê din hate diyar kirin ku di çalakiyan de 20 çalakger hatine destgîrkirin.



## Madûro ji êrîşa bombeyî rizgar bû




Li dijî Serokê Dewleta Venezûela Nîcolas Madûro dema ku di merasîma leşkerî ya li navenda paytext Caracas êrîşeke bombeyî pêk hat. Madûro bêyî ku birîndar bibe rizgar bû.
Li paytext Caracas li dijî Serokê Dewleta Venezûela Nîcolas Madûro êrîşeke bombeyî pêk hat.
Hate diyarkirin ku êrîş bi droneke ku tijî bombe lê hatibû barkirin, pêk hat. Wezîrê Ragihandinê yê Venezûelayê ragihand ku di êrîşê de Madûro birîndar nebûye û 7 leşker birîndar bûne.
Wezîr got; “Êrîş li dijî Serok Madûro pêk hatiye’. Piştî êrîşê Madûro axaftina xwe ya di merasîma leşkerî de qut kir.
Wezîrê Ragihandinê yê Venezûelayê got êrîşek bi dronê ku bombe lê hatibû bicihkirin li nêzî herêma ku serokê dewletê lê bû û êrîşa din jî bi dronê li nava leşkeran de pêk hat.
Wezîr got dronek li nava Muhafizkarên Netewî yên Bolîvya hate teqandin û 7 kes birîndar bûn.



# Perperokên Şêrko Bêkes


*Şêrko Bêkes her tim bi kulîlk, azadî, Helebce, çûk û perperokan li Kurdistanê geriya. Bi helbestên xwe yên dilşewat serî li hemberî qedera welatê xwe rakir. Got; “Qedera welatê wî û xweda hemane, her du jî bi tena serê xwe ne.”*



Şêrko Bêkes yek ji helbestvanên navdar ê gelê Kurd û cîhanê bû. Helbestvanekî yê serdemê bû ku bi helbestên xwe xizmet ji bo huner û dîroka gelê Kurd kiriye.
Dengê Şoreşê li kurahiya Newala Balekiyan, li şikeftekê weşan dikir. Radyoya yekane dengê Başûrê Kurdistanê ya pêşmergeyan bû.
Di sala 1965’an de ciwanek dibêje ‘Vir cihê dengê şoreşê ye’ helbesta dixwîne. Ew dengê li çiyayê Kurdistanê deng da, 50 salan li Kurdistanê bû dengê şoreşê, dengê helbestê.
Şêrko Bêkes her tim bi kulîlk, azadî, Helebce, çûk û perperokan li Kurdistanê geriya. Bi helbestên xwe yên dilşewat serî li hemberî qedera welatê xwe rakir. Got; Qedera welatê wî û Xweda hemane, herdu jî bi tena serê xwe ne.’ Helbestên wek ‘Giriyê Xweda’, ‘Biharên dimirin’, ‘Dara bêdeng’, ‘Goreyên wî yên tenê mane’, ‘çûkên xewnên wan mirine’, ‘11’emîn saeta Helebceyê nivîsî. Carna bangî Apê Musa kir. Digot ew bi pênûsa Apê Musa, bi guliyên porê keçikên Colemêrgê li vire.

### LI MALA ME FIND TUNEBÛ, LÊ BI HELBESTA RONÎ DIBÛ

Bavê Şêrko Bêkes, Faîq wek paşnavê xwe bêkes bû. Kalê wî di 1911’an de ji Bedxayê hat sûrgunkirin û wê demê Faîq Bêkes 7 salî bû. Çend sal şûnde dayika xwe wenda kir. Di sala 1930’an de Faîq li ser welatê xwe yê Bêkes helbest û sirûd xwend. Kurê wê Şêrko jî ji ber vê yekê gelek bi şans bû. Şêrko bi salan şûnde dê bigota ‘Li mala me find tunebû, em bi helbestan ronî dibûn’
Faîq Bêkes mamoste bû, li gelek bajarên Kurdistanê, gund û bajarokan digere. Lê Şêrko jî wek bavê xwe bêkes dimîne. Bavê wî Faîq Bêkes di 1948’an de jiyana xwe ji dest dide. Dayika wî Şafîqe xanim, kurê xwe Şêrko bi helbest û çîrokan mezin dike. Şêrko piştgiriya dayika xwe ya ji bo hezkirina helbest û kurdî dê her tim bigota. Şêrko helbeta xwe ya yekemîn di rojnameya ‘Jîn’ de weşand.Şêrko dibêje;Ez dinivîsim, ji bo eciziya ziman sivik bikim, ji bo eciziya xwe sivik bikim, lê ew ji bo piştgiriya bo hezkirina helbestê, hezkirina gel bû’ û di 1965’an te tevli refên pêşmergeyan dibe. Bi salan di radyaya ‘Dengê Şoreşê de’ xebitî.
Deng û helbestê Şêrko di guhê pêşgeryan de bû.



Şêrko Bêkes yekemîn dîwana helbestên xwe di sala 1968’an de di pirtûka bi navê”Tîrifey Helbest” berhev kir. Di van salan de di bin bandora Goran û hosteyên din de maye. Xwendevanên wî cara yekemîn sitîla wî û zimanê wî cara yekemîn di dîwana wî ya “Min Tînwyetîm be gir deşkê” a di sala 1973’an de hat weşandin de keşsf kir. Di sala 1970’an de bi komek nivîskar û helbestkar re danezeneke bi navê ‘Rîwange’ weşandin. Armanc wan ev bû ku wêjeya kurdî modern bibe.

### SALÊN DI NAVA DI XELATAN DE

Di sala 1975’an de dema têkoşîna azadiya kurd nû bû, Şêrko Bêkes surgunê başûrê Iraqê bû û 4 sal şûnde bi dîwanên Kaziwe û Koç vegeriya welatê. Saddam jî di bin bandora helbestê wî de ma. Sedam teklîfa ‘Xelata Kadisiye’ jê re dibe. Bêkes xelatê red dike û riya wiya çiyan vedibe. Duyemîn salên wî yên pêşmergetiyê dest pê dike.
Di sala 1986’an de diçe Swêdê. Negirtina xelata Sedam riya penaberiyê ji wî re vekiribû. Lê li Swêdê jî hêjayê xelatê tê dîtin. Di sala 1987’an de xebata wêjeyî ya Kurd Tuckhoslky ji destê serokwezîrê demî yê Swêdê Ingvar Carlson digire. Bêkes aliyê herî girîng yê portreya helbesta xwe di sala 1990’î de temam kir.

### HUN ÇAWA DIKARIN AMEDÊ JI SILÊMANIYÊ CUDA BIKIN

Di sala 1992’an de dema Başûrê Kurdistanê gihişt rêveberiya xwe, Şêrko Bêkes kesekî navdar û zêde eleqe didît bû. Yekemîn wezîrê çandê yê Başûr e. lê dema rojnameya Welat bi hinceta propagandaya PKK’ê kiriye hat girtin, ji peywira xwe îstîfa dike. Helbestên wî ya ‘Birakujî’ dîsa surgunî da ber wî û dîsa diçe Stockholmê.
Şêrko Bêkes di sala 1999’an de di 15’ê Sibatê de dema Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hat girtin di ekranên Med TV de ev helbest qiriya:
Ev der Silêmaniye, ev çend roje xemginiyeke mezin li ser vî bajarî heye. Li ber çavê cîhanê Ocalan girtin, lê nekarin ruhê Kurdan teslîm bigirin. Amedê çawa ji Silêmaniyê diketînin, Newroz çawa bê agir dibe? Gola Wanê çawa dikarin ziwa bikin? Ev der Silêmaniyê, hemû dilên vî bajarî wek sêveke darekê dilerizin, ji bêkesiya gelekî re xemgîn dibin. Ev xemginiyeke netewiye, min xewna perperokekî dît. Ez digirim û çavên min li Amedê ye.
Şêrko Bêkes her wiha li ser grevên birçûnê yên girtîgehên Bakûrê Kurdistanê jî got: “Li Bakur agirê şoreşê bilind dibe. Bedenên birçî nîşan dan ku kurd bi şer û zextan naqedin.”

### MIN LI BA ABÎDEYA ŞEHÎDAN DEFIN KIN

Şêrko Bêkes, 2 sal berê wesiyatnameya xwe nivisîbû. Bêkes diyar kiribû di şîna wî de bila tenê muzîk hebe û gotibû: “Min li Parqa Azadî ya Silêmaniyê li abîdeya şehîdan a di sala 1983’an de hatie avakirin de defin bikin. Li wir dê bîhna min neçike. Jinên ciwan, mêrên ciwan, hezkiriyên hev dê bibin mîvanên min. Bêkes di sibeha 4’ê Tebaxa 2013’an de, beriya ku bîhna xwe ya dawî bide, dibe ku li ber paca wî perperok geriya bin û helbeta wî ya bi salan berê nivîsibû hatibû bîra wî.
Şêrko Bêkes di salên zor û zehmet yê Kurdistanê de bû bihna azadî, berxwedan û kurdbûnê. Di dilê xwe de her tim hezkirina Çiyayê Emzîr ya Silêmaniyê, Çemê Sirwan a Haleoçeyê, Newala Şarezur, Babagurgur a Kerkûkê gerand.
Bêkes digot dema li kolanên Hewlêr, Sîne, Mahabadê digere wê Amedeke azad maçî bike:
“Maçeke min heye heya niha / Nikare ji lêvên min / Cuda bibe û / Bighêje dev û lêvên wê / Dev û lêvên wê li Amed / Ez jî li vir... / Ev maça min / Bi vê mij û dumanê nikare / Rêya hovan bibre û / Bighêje surê li dora bajar / Ev maça min / Tenê wê demê dighê yar / Asmana Amed sahî be û / Azadî jî bibe baskên wê.”...
*ANF*

## Pêşketina tevgerên neteweyî û nasname



Derwêş M. FERHO

Li ser vê mijarê bîr û baweriyên cuda hene. Yek ji van kesan jî zanayê Çek, Miroslav Hrosch e (°1932). Lêkolîn û xebatên hêja pêk anîne. Herçend e ew li ser vê mijarê di çarçeweya Ewropa de kar kiriye jî, ji bo me Kurdan mînakek balkêş e.
Di lêkolîna li ser avabûn, pêşketina tevgerên netewî û nasnamê de sê qonaxan dibîne. Rola materialên bi giranî ji aliyê rewşenbîran tên berhevkirin ku nasnameya neteweyî were pêkanîn, ji aliyê aktivîstan (xebatkarên berjewendiyên gel diparêzin) berhevkirina kes û koman bi girseyî ji bo pêkanîna vê projê, bi pêkhatina tevgera girseyî, vcivaka ku vê prosesê dike rastiya jiyanê.
Wek tê zanîn ku li Çekiye, gel ji bo parastina ziman û çanda xwe, têkoşîneke bi wate di hember Germanîzmê (Elmanî/Otrîşî) bi rê ve bir. Bi taybetî serdestiya Germanî di herêmên Bohem û Moraviye de ku hebûna Çekî dikir bin xetera hundabûnê. Lê gelê Çek rêya hundabûnê bi awayê xwe, xebateke pirralî bertaraf kir.
Siyaseta Germanan, mecbûrkirina bikaranîna zimanekî hevpar ku her kes bikaribe tê bigihije û bi yekbûna welêt were parastin. Bê goman “ew ziman jî Almanî” bû. Û her kesekî ku bixwesta bibe xwedî ciyekî balkêş diviya Almanî bizaniya. Dibistanên Almanî bi hemû derfetên dewletê dihatin xwedîkirin. Herçend e ji bi Çekan bikaranîna zimanê wan di jiyana rojane de ne qedexebû jî, zimanê wan ketibû nava çarçeweya zimanê “gundîtiyê.”
Di nîvê sedsala nozdehan de Çekên xwedî erkeke neteweyî, lê kêm derfet di hember parêzvanên Almanî û karmendê dezgehên dewletî de dijberî peyda bû û roj bi roj xurt bû. Ev têkoşîn bû sedema ku di 1882 zanîngeha Pragê pejirandina perwerdeya du zmanî bi xwe re anî. Almanî û Çekî. Li bajarên din jî li herêma Bohêman ev destkeftî pêk ahtin. Di demeke kurt de bi xêra tevgera neteweyî perwerdeya bi zimanê Çekî pêşket û Almanî kêm bû.
Bi têkçûna hêza Alamanî paş şerrê cîhanê 1, Çek û Slovakan dewleta xwe ya hevbeş ava kirin. Ev rewş ji Almanîaxêvan re pirr giran dihat. Hikûmeta ku di navbera 1939 û 1945 de li dervayê welat dima, paş vegera xwe hewqas bêhnteng bûbû ku paş şerr qediya hemû Almanpîaxêvan ji welê derxin.
Dema meriv li rewşa me Kurdan dinêre, mînakên hevpar xuya dikin. Li Bakur zimanê Turkî bi hemû hêza dewletî serdest e. Kurdî ji aliyê sêstemê qedexe ye û di heman demê de siyaseta piçûkkirin û bikêrnehatina zimanê Kurdî heye. Bê goman Kurdbûn, herweha gelên din jî, di bin qedexe û xetera tinekirinê de ye. Li Rojhilat jî rewş xerab e. Meriv dikare bi rewşa Bakur re muqayese bike. Li Başûr û di van salên dawîn de li Rojava rewş wekî din e. Lê dîsa tengasî pirr in û pêdiviya hişmendî û hişyariyeke kûr heye ku zimanê Kurdî ciyê xwe yê bi rûmet bigre.
Ji bo em xwe ji vê rewşa şermokî azad bikin barê me tevan giran e lê ne ku nemimkin e. Berî niha min gotiye û nivîsiye: Xwedîderketina zimanê dayikê di her cî û warî de, bikaranîna wî di perwerdê de li welêt û di nava civaka xwe de. Pêdiviya bikaranîna zimanê Kurdî di sazî, komele, partî û malbat tê de şert e. Li dervayê welê qet ti zor û tengasî nînin ku em Kurd zimanê xwe biaxivin, binivîsin, bixwînin. Heta bi avakirina xwendegehan jî mimkin e. Bes em Kurd bixwazin û bikin.

# Li Amûdê avahîsazî bi pêş dikeve

**Li Amûdê xebatên avakirina avahiyan li gor salên berê zêdetir û hêsantir buye. Avakirina avahiyan ku ji ber şertên awarte yên şer rawestiya bû, bi sazkirina ewlehiya li herêmê û pêre careke din destpê kiriye. Şarederiya Gel jî di vê mijarê de alîkariya pêwîst dike.**

Li Amûdê di van demên dawîn de piştî ku Şaredariya Gel hewcedariyên pêwîst pêşkêş kirin, di warê avahîsaziyê de pêşketin pêk hat. Di encamê de derfetên kar jî ji gelek welatiyan re peyda bûn.
Xebatên avakirina avahiyan li herêmên Rojava û Bakurê Sûriyê ji ber rewşa li herêmê heta asteke bilind rawestiyabû. Piştî ku ewlehî û aramî pêk hat di van demên dawîn de avakirina avahiyan zêde bûye û avahîsazî li gorî pîvanên ku Buroya Pîşesaziyê ya Şaredariya Gel diyar kirine, gelekî bi pêş ketiye.
Yek ji sedemên pêşketina rewşa avahîsaziyê li navçeya Amûdê li gorî avahîsazan ew e ku amûrên avakirinê li gorî salên borî erzan bûne.
Bi armanca parastina welatiyan, Şaredariya Gel ji bo avakirina xaniyan pîvanên xwe diyar kirin. Piştî ku welatî belgeyên xwe yên milkiyetê pêşkêş dikin, Buroya Pîşesaziyê ya Şaredariyê cihê ku avahî tê de were avakirin, lêkolîn dike. Buroyê her wiha ji bo avakirina avahiyan çêkirina jêrzemînekê wek merc ferz dike da ku di rewşên awarte de niştecihên avahiyê xwe bispêrin van jêrzemînan.
Karkerên avakirina avahiyan ên navçeya Amûdê diyar kirin ku xebatên wan gelekî ji salên borî baştire û ew avahiyan li gorî plan û pîvanan ava dikin. Kamîran Cizîrî ku hosteyê siwarkirina seramîkê ye, wiha got: "Kar baş e û buhayê amûrên avakirinê jî li gorî salên borî erzan bûye." Cizîrî diyar kir ku gelek dost û hevalên wî koçber bûne û piştî ku derfetên kar li vir zêde bûne, gelek ji wan vedigerin.
Cizîrî girêdayî geşbûna avahîsaziyê di van demên dawî de, diyar kir ku sedema sereke ew e ku aramî û ewlehî bi saya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li herêmê peyda bûye û sedema duyemîn jî ew e ku bi hezaran welatiyên herêmên din ên Sûriyê berê xwe didin herêma Cizîrê û pêwîstî bi niştecihkirina van welatiyan zêde bûye…*ANHA*



## Akademî hişmendiyeke nû pêşdixin




Akademî stûna sereke ya avakirina civaka exlaqî û polîtîk in û roleke girîng di pêşxistina zanista civakê û rakirina hişmendiya desthilatdariyê de dilîzin.
Akademiyên bîrdozî yên ku li Bakurê Sûriyê hatine vekirin li ser vê bingehê dixebitin.
Bi pêvajoya Şoreşê re, li Rojava û bakurê Sûriyê akademiyên perwerdeyê hatin vekirin.
Akademiyên bîrdozî ku li ser bingeha neteweya demokratîk roleke girîng di birêxistinkirina civakê û xwenaskirinê de dilîze.
Piştî rizgarkirina bajarê Minbicê ji çeteyên DAIŞ'ê, akademiyên pewerdeyê hatin vekirin û beşeke mezin ji civakê di akademiyan de mezûn bûn.
Akademiyan heya radeyeke berbiçav dikarîbû fikrên paşverû ji hole rake û rastiya jinan bi civakê bide naskirin.
Ji perwerdekarên Akademiya Bîrdozî ya Şehîd Îsmaîl Mûsa, Mehmûd Bekirî derbarê akademiyan de wiha got: "Di dema dagirkirina çeteyên DAIŞ'ê ya Minbicê de fikrên DAIŞ'ê di mêjiyê gelek kesan de hatibûn çandin, vê yekê bandoreke neyinî li tevahiya civakê kir. Akademî bi armanca rakirina van fikran hatin avakirin."
Mehmûd Bekirî destnîşan kir ku perwerdeyên li akademiyan li ser bingeha neteweya demokratîk, avakirina civakeke exlaqî û polîtîk, wekheviya di navbera jin û zilaman de têne dayîn.
Li bajarê Minbicê bi giştî 7 akademî hene, 4 jê leşkerî ne û



yek jî ya jineolojiyê ye.
Ji dema vekirina akademiyan ango piştî rizgarkirina bajar ji çeteyên DAIŞ'ê, li Akademiya Şehîd Îsmaîl Mûsa ya Bîrdozî 17 dewre hatin vekirin û bi hezaran kes jê mezûn bûn. Her wiha 5 dewreyên perwerdeyê ji bo mamosteyan hatin vekirin, tê de derdora 4 hezar mamosteyan perwerde dît.
Bekirî anî ziman ku armanca pewerdeyan avakirina mirovên azad û civakeke demokratîk û rakirina fikrê nîjadperest û pêşxistina çanda jiyana hevbaş e…*ANHA*

## Divê budçeya şaredariyan bê veqetandin



Welatiyên deverên başûrê herêma Cizîrê daxwaza xizmetguzariyên pêwîst ên wekî kanalîzasyon, ava vexwarinê û paqijiyê dikin. Bi taybet budçeya şaredariyên nû nehatiye veqetandin. Meclisa Rêveber a Komîteya Şaredariyan piştrast kir ku ew ji bo veqetandina budçeya şaredariyên nû di nava hewldanan de ne.
Deverên başûrê navçeya Tirbespiyê bi taybet deverên nû ji destên çeteyên DAIŞ'ê hatine rizgarkirin, ji ber kêmbûna xizmetguzariyên sereke astengiyan dikişînin. Bi armanca vejandina van deveran, piştî hilbijartinên dawîn ên Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyê li van deveran gelek şaredarî hatin avakirin.
Lê ev şaredariyên nû hatine avakirin hê jî budçeyeke wan a taybet nehatiye veqetandin û di encamê de hê jî nikarin xizmeta welatiyan bikin.

### KANALÎZASYON TÊK ÇUNE

Yek ji van şaredariyan Şaredariya Ebû Ferih a başûrê Tirbespiyê ye. Welatiyên bajarok daxwaza kêrhatîkirina şaredariyê dikin da ku pirsgirêkên welatiyan bêne çareserkirin. Welatiyê bi navê Ebas Salih diyar kir ku çeteyên DAIŞ'ê binesaziya bajarok têk biriye û bang li aliyên têkildar kir ku di demeke lezgîn de kanalîzasyonê sererast bikin û xizmetguzariyên sereke yên wekî peydakirina ava vexwarinê pêk bînin.
Endamê Şaredariyê Mehmûd El-Helo destnîşan kir ku wan gelek giliyên welatiyan ên derbarê kanalîzasyonê de wergirtine, bi taybet ji ber ku ji bo tenduristiya giştî ya welatiyên bajarok metirsiyek e.

### DIYARKIRINA BUDÇEYAN

Hevseroka Şaredariya Gel a bajaroka Ebû Ferih, Menal El-Helo destnîşan kir ku budçeya şaredariya wan hê jî nehatiye veqetandin û diyar kir ku ew ji bo baweriya gel wergirin di nava xebatan de ne û bang li Meclisa Şaredariyan a Qamişlo kir ku di demeke lezgîn de budçeya şaredariya wan veqetînin da ku bikarin xizmeta welatiyan bikin.
Endamê Rêveberiya Meclisa Şaredariyan a Qamişlo Mesûd Yûsif piştrast kir ku ji bo veqetandina budçeya van şaredariyên nû hatine avakirin ew di nava hewldanan de ne û wê hemû pêdiviyên sereke ji wan re peyda bikin da ku karibin xizmeta welatiyan bikin û pirsgirêkên van deveran çareser bikin...*ANHA*

## Komxebata Îslama Demokratîk hate lidarxistin

Li bajarê Hesekê Komxebata Îslama Demokratîk bi armanca şîrovekirina wateya Îslama demokratîk hate lidarxistin. Di komxebatê de girîngiya lidarxistina Kongreya Îslama Demokratîk hate destnîşankirin.
Komxebata Îslama Demokratîk roja 4'ê vê mehê bi dirûşma "Ji Perspektîva Îslama Demokratîk ber bi înşaya civaka exlaqî û polîtîk " bi beşdarbûna bi sedan şêniyên Hesekê û oldaran li hola Selam a bajarê Hesekê hate lidar xistin.
Endamê Yekîtiya Oldarên Musilman a herêma Cizîrê Nûredîn Şakir axaftina destpê kir û dest nîşan kir ku di salên derbasbûyî de li Rojhilata Navîn gelek kom bi navê îslamê derketin, lê di rastiya xwe de ji baweriya îslamê dûr in, ew dijminên îslam û mirovahiyê ne, armanca wan reşkirina ola îslamê ye.
Nûredîn Şakir komkujiya ku çeteyên DAIŞ'ê 3'ê Tebaxa 2014'an li dijî gelê Êzidî yê Şengalê pêk anî ûn şermezar kir û hemû mirovên ku di komkujiyê de şehîd bûne bi bîr anî. Şakir her wiha peyama Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a ku ji Kongreya Îslama Demokratîk ku li Amedê re şandibû xwend.



Di komxebatê de, endamê Yekîtiya Oldarên Musilman Mazin Mihemed li ser demokrasî di Îslamê de diyar kir ku hêzên serwer wateya demokrasiyê bi desthildardarî û dewletê ve girêdidin, modernîteya kapîtalîst ku qaşo banga demokrasiyê dikin hewl didin civakê bihelînin û bê îrade bikin. Mihemed got, "Divê wateya rasteqîn a demokrasiyê û têkiliyên di navbera Îslamê û demokrasiyê de ji civakê re were danasîn."
Seroka Buroya Karûbarên Olî ya Hesekê Ezîza Xenafir jî got: "Îslam banga wekheviya di navbera jin û mêr de dike. Qûrana pîroz jî mafê jin misoger dike."
Ezîza wiha got, "di zilma di dîrokê de ya li ser jinan di serdema niha de dîsa xwe dubare dike, mafên jin jê dest hatiye girtin. Di Qûranê de qala mafê jin hatiye kirin, lê mixabin civakê di piratîkê de ev rastî berevajî kiriye."
Endamê Yekîtiya Oldarên Musliman Heysem Ehmed jî destnîşan kir ku girêdana îslamê bi tundiya li cîhanê nîn e û got, "Îslam ola aşîtî û lêborînê ye, ne ola kuştin û tundiyê ye."
Komxebat bi nîqaşên li ser girîngiya lidarxisitna kongreya Îslama Demokratîk, belavkirina çanda lêborîn û aştî û demokratiyê bi dawî bû…*ANHA*



# Kujerên Siwêda û Efrînê yek in

***Endama Meclîsa Jin ya PYD'ê a li Efrînê Şoreş Xelîl diyar kir ku jinên Kurd ji bo tevahiya jinên Sûriyê çavkaniya hêz û hêviyê ye. Şoreş bal kişand li ser êrîşên li dijî jinan û wiha got, "Çi li Şengal, Efrîn, Kobanê dibe, çi jî li Siwêdayê dibe kujer yek in."***



**Şîlan XOCE**

Şoreş Xelîl Endama Meclîsa Jin a Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD li Efrînê derbarê destdirêjiya li ser jinê û bi taybet revandina jinên Siwêdayê got, "Di dîrokê de; her jin rastî destdirêjiya û şîdeta zihniyeta zilamê serdest hatiye. Heya roja me ya îro, jin ji bo berjewendiyên desthilatdariyê tê kuştin, tecawizkirin û revandin."

### JIN ÇIRÛSKA HÊVIYÊ YE

Xelîl bi bîr dixe ku jina Kurd di heyama Şoreşa Rojava de pêşengtî kiriye û ev tişt anî ziman: Jinên Rojavayê Kurdistanê di aliyên siyasî, dîplomasî, leşkerî, civakî û aborî de pêşengtiya şoreşa zihnî ya Rojavayê Kurdistanê kirine. Jina Kurd ji bo jinên tevahî Sûriyê û cîhanê çirûska hêviyê ne. Li kêleka jina Kurd, jina Sûriyê jî sekiniye. Xelîl dewam dike: Pêşengtiya jina Kurd ji Şoreşa Rojava re bala jina Sûriyeyî jî kişande ser xwe. Bi vî rengî jî jina Sûriyeyî erkên pêşengtiya Şoreşa Rojava girtin ser milê xwe û di çeperên têkoşînê de gihaştin asta şehadetê.

### JINA PÊŞENG HEDEF TÊ GIRTIN

Xelîl dibêje ku ev rêxistinbûna jinê li kêfa desthilatdaran nehat û asta destdirêjî û gefên li ser jinan zêde kirin. Xelîl êrişên dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên DAIŞ li ser Efrînê û Siwêdayê weke mînak girte dest û ev tişt got: Ji ber ku Erdogan dixwaze sîstemek cinsiyetparêz li Tirkiyê û herêmê ava bike, tevî çeteyên xwe êrişî cihê herî birêxistinkirî li Sûriyê Efrîn kirin. Li Efrînê jinê jiyan û polîtîka bi rê ve dibir. Naxwazin jin serî hilde. Ji amûrekî bêtir nagirin dest. Ji ber vê yekê di serî de jina pêşeng a ku bi paradîgmeya Şoreşa Rojava re hatiye afirandin û bandor li tevahî jinên Sûriyê û cîhanê kiriye, li Efrîn û piştre li Siwêdayê hate hedefgirtin.

### KUJER YEK E

Xelîl destnîşan dike ku komkujiya vê dawiyê li Siwêdayê qewimiya destê zihniyeta Erdogan û çeteyên DAIŞ tê de heye û got: Ti ferq û cudahî navbera vê komkujiya Siwêdayê û ya Şengalê de nîne. Heman zihniyetê ev qetlîam pêk aniye. Çi li Şengal, Efrîn, Kobanê dibe, çi jî li Siwêdayê dibe. Kujer yek e. Peyama hemûyan jî ev e; nabe jin ji bo azadiya xwe serî hilde. Lazime jin her di nava koletiyê de bijî û ji serdestan re bibe amûrê kirîn û firotinê.
Endama Meclîsa Jin a Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD Şoreş Xelîl di dawiya nirxandinên xwe de komkujiya li Siwêdayê şermezar kir û bang li tevahî jinên cîhanê kir ku; erkên xwe yên mirovî pêk bînin û ev tişt anî ziman: Pêwîste hemû jinên dunyayê li dora têkoşîna jinê xelek bigirin. Ancax bi hişmendiya pêşeng a têkoşîna azadiyê jin rizgar bibe. Ev kiryarên dermirovî derheqê jinan de wê berovajî fikrandinên serdestan, asta têkoşîna jinê bilinditir bike. Wê israra me ya azadiyê jî tekûztir bike.

## Li Reqayê pêşxistina aboriya jin




Bi armanca pêşxistina aboriya jinan, Buroya Jinan a Meclisa Sivîl a Reqayê kargeheke dirûtinê li bajêr vedike.
Buroya Jinan a Meclisa Sivîl a Reqayê xebatên amadekirina kargeha dirûtinê didomîne. Kargeh li taxa pîşesaziyê ya li hemberî Deriyê Bexdayê ye. Niha avahiya kargehê ji derve û hundir ve tê sererastkirin. Her wiha di pêngava yekemîn de kargeh bi 15 makîneyên dirûtinê tê amadekirin û ji bo xebitandina kargehê jî, wê jinên ku bi dirûtinê dizanin, di kargehê de bên bi cih kirin.
Kargeh ji du odeyan û holeke mezin ji bo pêşkêşkirina cil û bergan, pêk tê.
Endama rêveber a Buroya Jinan a Meclisa Sivîl a Reqayê Sûad Kirdî destnîşan kir ku proje wê derfetên kar ji jinên Reqayê re peyda bike, aboriya wan geş bibe û diyar kir ku kargeh wê di meha bê de were vekirin. Ev proje wek projeya yekemîn a taybet ji bo jinan li Reqayê tê hesibandin…*ANHA*

## Kongreya Star banga rawestandina tundiya li ser jinan kir

Rêxistina Kongreya Star a herêma Dêrikê derbare kiryarên çete û leşkerên artêşa tirk a dagirker banga avakirina komîteyeke lêpirsînê û rawestandina tundiya li ser jinan kir.
Rêxistina Kongreya Star a herêma Dêrikê di çarçoveya qonaxa duyemîn a Pêngava "Jin ji bo cîhanê serî hildin " de li ser kiryarên çete û leşkerên artêşa Tirk a dagirker daxuyanî da.
Daxuyanî bi amadebûna bi dehan endamên Kongreya Star ji aliyê endama kongreyê Meyada Necar ve hate xwendin.
Di daxuyaniyê de kiryarên artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê yên li Efrînê, talankirina milkên sivîlan û guhertina demografiya Efrînê hate şermezarkirin û banga şandina alîkariyan ji bo şêniyên Efrînê yên li kampên Şehbayê li rêxistinên navdewletî hate kirin.
Her wiha hate gotin ku jin, zarok û kesên bi temen mezin herî zêde zextê ji dagirkern dibînin.
Di berdewama daxuyaniyê de bang li rêxistinên navdewletî hat kirin ku komîteyeke lêpirsînê li Efrînê ava bike da ku binpêkirinên artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê dijî sivîlan bi belge bike, her wiha banga rawestandina tundiya li ser jinê hate kirin… *ANHA*



## Em ê li hember Tirkkirinê têkoşînê bikin





**Nûnerên KPCD yên ku beşdarî Yekemîn Kongreya KPCD- Jin a Bakurê Sûriyê bûn diyar kirin ku deweleta tirk a dagirker li hemberî sîstema Neteweya Demokratîk a ku li Bakurê Sûriyê hatiye rûniştandin, polîtîkeyên tirkkirinê dimeşîne û anîn ziman ku ew ê li hemberî hemû pergalên desthilatdar, têkoşînê bikin.**
**Nûnerên hemû bajar û herêmên Bakurê Sûriyê yên ku tevlî Yekemîn Kongreya KPCD-Jin a Bakurê Sûriyê bûn, li ser girîngiya lidarxistina kongreyê axivîn û diyar kirin ku lidarxistina kongreyê di vê pêvajoya hesas de ji bo jinan serkeftinek e mezin e.**
**Gulîstan Elî Ebdo ku ji herêma Şehbayê hatibû tevlê Kongreyê bû li ser armanca tevlêbûna xwe wiha got: "Ez tev li kongre bûm da ku, rastiya polîtîkeyên dewleta tirk a dagirker derxînin holê, ku zimanê xwe li ser gelê Efrînê ferz dike."**
**Gulîstan destnîşan kir ku di nava salên borî de li Efrînê hemû pêkhateyan bi zimanê xwe yê dayîkê perwer didîtin, piştî hate dagirkirin dewleta tirk zimanê xwe ferz dike û hemû zimanên din jî înkar dike.**
**Gulîstan di berdewama axaftina xwe de diyar kir ku li Şehbayê tevî hemû astengiyan ew teslîm nebûn û wiha dewam kir: "Me xwe di aliyê pewerdeyê de ji nûve bi rêxistin kir. Me dibistan vekirin û dest bi pêşwazîkirina xwendekaran kirin. Em tekez dikin ku em tu carî dev ji zimanê xwe bernadin û em ê bi hemû awayan zimanê xwe biparêzin."**
**Nebîha Elî jî anî ziman ku lidarxistina kongreyê di vê pêvajoya hesas de ji bo jinan serkeftinek e mezin e.**
**Nebîha destnîşan kir ku ew tu carî derfet nadin dewleta tirk a dagirker ku armancên xwe pêk bînin, çanda gelan tune bike û zimanê xwe li ser şêniyên Efrînê ferz bikin û wiha dewam kir,"Dewleta tirk a dagirker û çeteyên wê dibistanên Efrînê veguherîne girtîgehan û li wê derê kiriyarên hovane pêk tîne."**
**Di dawiyê de Nebîha diyar kir ku kongreya wan ji bo hemû zehmetiyên li pêş ziman rabin pir girîng e…*ANHA***

# Divê herkes li rêber Apo xwedî derkeve

**Hevseroktiya Konseya Rêveber a KCK'ê destnîşan kir ku ji 5'ê Nîsana 2015'an û vir ve li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tecrîdeke giran heye û got, "Tecrîd û zexta li ser Rêbertî tecrîd û zexta li ser gelê Kurd e. Têkoşîna dijî tecrîdê her wiha têkoşîna dijî polîtîkayên şer û faşîzmê ye."**

KCK'ê bang li hemû hêzên demokrasiyê kir ku li dijî zext û tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan rawestin, li ser vê zemînê têkoşîna dijî faşîzmê tam û watedar bikin.

Hevseroktiya Konseya Rêveber a KCK'ê destnîşan kir ku ji 5'ê Nîsana 2015'an û vir ve li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tecrîdeke giran heye û got: ''Ji 27'ê Tîrmeha 2011'an ve nahêlin ku parêzerên xwe bibîne. 2016'an bi encama zexta raya giştî birayê xwe Mehmet Ocalan bi demeke kurt dîtiye. Ne tenê Rêber Apo, 3 girtiyên din yên şoreşger ên li Imraliyê jî parêzerên xwe nabînin. Ev tecrîda giran bi binpêkirina peymanên navnetewî û destûra sazkar a Tirkiyê pêk tê.''

Di da xuyaniyê de hate gotin, ''Mirov çawa nêzîkî rêberê civakekê bibe mirov wiha nêzî wê civakî jî dibe'' û wiha hat gotin, ''Ji vî alî ve nêzîkatiya li Rêbertiyê nêzîkatiya li gel e. Tecrîd û zexta li ser Rêbertî tecrîd û zexta li ser gelê Kurd e. Têkoşîna dijî tecrîdê her wiha têkoşîna dijî polîtîkayên şer û faşîzmê ye.''

### 'NÊZÎKATIYA LI RÊBERTÎ NÊZÎKATIYA LI HÊZÊN DEMOKRASIYÊ YE'

KCK'ê di daxuyaniya xwe de wiha berdewam kır: "Nêzîkatiya li Rêbertî nêzîkatiya li hêzên demokrasiyê ye. Rêber Apo ji bo ku Kurd û hêzên demokrasiyê gihandine hev faşîzma mêtinger a qirker li dijî Rêber Apo bi hêrseke mezin e. Ji vî alî ve tecrîd û politikaya zextê ya li Imraliyê tecrîd û politikaya zextê ya li ser hemû hêzên demokrasiyê ye. Divê hemû hêzên demokrasiyê, sosyalîst û şoreşger zanibin, heta ku mirov li Rêber Apo xwedî dernekevin, li Tirkiyê têkoşîna demokrasiyê û azadiyê wê ne tam û rast be.Têkoşîna demokrasiyê û azadiyê tenê mirov nikare bi Kurdan ve bihêle, têkoşîna dijî tecrîd û zexta li ser Imraliyê jî divê tenê ji Kurdan neye hêvîkirin.



### CPT Û KE TECRÎDÊ NORMALÎZE DIKIN

Rêxistinên mafê mirovan, parêzerên Rêber Apo, malbat, rayedarên HDP'ê, gelek sazî û kesên demokrat şoreşger, rêxistinên şoreşger, tevgera jina Kurd tecrîd û zexta li Imraliyê kirine rojev. Di demeke wiha de ku faşîzma Kurd û nirxên Kurdan zêdetir kiriye hedef, rewşa Rêbertî ku Kurd jê re hesas in kirine rojevê. Di rewşeke wiha de kul i ser Rêberê Kurd êrîşên giran hene, derbarê tenduristî û ewlehiya Rêberê Gelê Kurd ti agahî tine. CPT û Konseya Ewropa ku di vê mijarê de berpirs in, bi nêzîkatiya xwe zextên li ser gelê Kurd meşrû dikin û tecrîd, zexta li Imraliyê normalîze dikin.

### DIVÊ RÊGEZ Û BERPIRSYARÎ WERIN BICIHANÎN

CPT li girtîgehên cuda û li welatên cuda her çendî binpêkirina mafê mirovan ji bo ku li cih bibîne plan kiribe jî, di di nav planê de Imralî tine û ev jî tê wê maneyê ku CPT û Konseya Ewropayê qirkirina dewleta Tirk a li ser Kurdan û tecrîda giran a li Imraliyê dipejirînin. Gotina 'bêdengî ji pejirandinê tê' tam li vê helwesta CPT û Konseya Ewropayê digunce. Dewleta Tirk li Imraliyê pêkanînên taybet ê ji bo kesan dike, CPT û Konseya Ewropa jî dema ku mijar dibe Kurd û Rêbertiya Kurd rêgezên xwe ji bîr dike û bi berpirsyariya xwe ranabe.

### BÊDENGÎ PEJIRANDIN E

Li Tirkiyê hemû zext, zilm û faşîzm ji ber polîtîka û kirinên li dijî Kurdan ên li ser Imraliyê ne. Bêdengiya li bara zexta li ser Kurdan û Rêbertiya Kuran pejirandina faşîzma li Tirkiyê, pejirandina zilma li ser Kurdan û hêzên demokrasiyê ye. Gelê Kurd û hêzên demokrasiyê helbet ji van saziyan wê bixwaze ku pêgirê rêgezên xwe bin û tişta hewce bikin.

Divê Kurd û hêzên demokrasiyê yên Tirkiyê vê bibînin; faşîzma li Tirkiyê tenê bi baweriya bi hêza xwe û bi vê çarçoweyê bi têkoşînê dikare were şikandin. Divê were dîtin ku yek ji parçeya girîng ê têkoşîna qelskirina faşîzma li Tirkiyê, xwedîderketina li Rêberê Gelê Kurd û rawesta li dijî tecrîd û zexta li Imraliyê ye.

Ji vê hêlê ve, em bang dikin li dijî faşîzmê divê têkoşîn were dayin, hemû hêzên demokrasiyê li dijî zext û tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd ra bin, li ser vê zemînê têkoşîna dijî faşîzmê tam û watedartir bikin.''

# Tirkiyê Opozîsyona Sûriyê firot



Nûnerê Partiya Nûjen û Demokratîk li Sûriyê ya Buroya navçeya Til Hemîsê Îd El-Hisên got: "Tirkiye li gorî berjewendiyên xwe tevdigere, li gelek deveran opozisyon firot."

Nûnerê Partiya Nûjen û Demokratîk li Sûriyê ya Buroya navçeya Til Hemîsê Îd El-Hisên da zanîn ku hikûmeta Tirkiyê bi zihniyeta Osmanî hewl dide serweriya xwe li ser herêmê ferz bike û nasnameya gelan ji holê rake."

Îd El-Hisên bal kişand li ser gefên dewleta Tirk ên li ser Minbicê û herêmên din ên Sûriyê û got: "Kiryarên ku Tirkiyê yên li dijî gelê Tirkiyê ji aliyê cîhanê de tê zanîn. Rewşa dagirkirina li herêmên weke Efrîn û Cerablûsê her kes dişopîne. Li Efrînê koçberkirin, êşkence û hwd, kiryarên wan eşkere ne."

El-Hisên di nava axaftina xwe de got: "Tirkiyê li gorî berjewendiyên xwe tevdigere, baweriyê nade hevalbendên xwe, li gelek deveran opozisyon firot."

Îd El-Hisên berevajî îdiayên Tirkriyê diyar kir ku li Bakurê Sûriyê hemû gel bi hev re di nava wekheviyê de dijîn û got, "lê Tirkiye hewl dide vê yekîtiyê û aşitiyê xera bike û gelên herêmê bide koçber kirin."… *ANHA*

# Astengkirina Tevgera Azadî cihê fikaran e

Endamê Serokatiya Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê Hisên Kerkûkê diyar kir ku dûrxistina wan a ji hilbijartinê wê komîsyona hilbijartin û dadgehê jî bixe nava fikaran.

Biryar e ku di 30'ê Îlonê de hilbijartinên dema 5'an a Parlamentoya Herêma Kurdistanê (Başûrê Kurdistanê) pêk were. Bi giştî 28 lîsteyan xwe ji bo beşdarbûna hilbijartinê amade kirine. Tenê rê nehatiye dayîn lîsteya Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê beşdarî hilbijartinê bibe, bi hînceta ku fermîbûna Tevgera Azadî nîne beşdar bibe. Lê Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê mafê fermîbûnê ji komîsyona serbixwe ya Hilbijartinên Iraqê girtiye û weke partiyekî siyasî hatiye naskirin. Mafê karkirinê li tevahiya Iraq û Herêma Kurdistanê heye.

Endamê Serokatiya Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê Hisên Kerkûkî têkildarî astengkirina li pêşiya partiya wan axivî û got; "Rewşa siyasî ya Herêma Kurdistanê hatiye rawestandin. Ji sala 2014'an parlamentoya Herêma Kurdistanê hatiye belavkirin. Cihê serokatiya Herêma Kurdistanê vala maye. Herêm rastî krîza aborî û siyasî ya dijwar hatiye. Me jî weke erkekî exlaqê siyasî bi armanca çareseriyê projeyek ji bo xilaskirina Herêma Kurdistanê ji vê rewşê pêşkêş kir. Me xwest beşdarî hilbijartinên 30'ê Îlonê bibîn.

Lê mixabin Komîsyona Bilind a Serbixwe ya Hilbijartin û Rapirsiyê ya Herêma Kurdistanê bi biryarekî siyasî Tevgera Azadî asteng kir û rê neda beşdar bibe.

Hisên Kerkûkî wiha got; "Ne dengdana li herêmê û ne jî komîsyona serbixwe ya hilbijartinê serbixwe ye ku bi hevbeşî li gel wezareta navxweyî bê planekê Tevgera Azadî ji hilbijartinên herêm dûrbixe.''

Hisên Kerkûkî Partiya Demokratîk a Kurdistanê (PDK) sûcdar dibîne ku nehiştiye Tevgera Azadî beşdarî hilbiajrtinan bibe û wiha got; "Biryara PDK'ê siyasî ye û dixwazin vêya bikin qanûnî. Aliyên siyasî yên ku dibêjin em demokrasiyê dixwazin li beramberî vê plangeriya dijî Tevgera Azadî ji derveyî Nifşê Nû ti aliyên din helwest nîşan ne dane."



Endamê Desteya Serokatiya Tevgera Azadî Hisên Kerkûkî herî dawî wiha got; "Qedexekirina beşdarbûn a Tevgera Azadî ji bo hilbijartinên parlamentoyê wê komîsyona hilbijartin û dadgehê jî bixe nava fikaran. Piştî goftûgoyên di nava partiyê de em ê di demek nêzîk de helwest û nirxandinên xwe yên di derbarê hilbijartinên parlamentoyê de eşkere bikin."…*ANF*

## Hesabên kesî li Sûriyê pêknayê



Ezîz KOYLUOGLU

Civîna 10'an di bin sîwana Rûsya, Îran û Tirkiyê de dîsa pêk hat. Li ser Sûriyê civîn li ser civînê tê lidarxistin. Ev civîn him di hundirê Sûriyê de him jî li derveyî Sûriyê pêk tên. Civîna MSD û rejîma Sûriyê van civînên li derve bêwate dike. Lê heta niha çareseriyekî berbiçav ji wan hevdîtinan derneketiye. Li ser Sûriyê gelek dewlet siyasetê dikin û wan dewletan heta niha li ser Sûriyê lihevnekirine. Yek ji sedema dewam kirina şerê li Sûriyê jî, şerê dewletên ku dixwazin Sûriyeke li gorî berjewendiyên wan ava bibe. Ji bo wê çareseriya li Sûriyê hinek jî li gorî biserketin yan jî lihevhatina dewletên li ser Sûriyê yê hesabê wan hene ye. Xuya bû ku garantorên civîna Astana êdî wek berê lihevnakin û li ser mijarên berê ku lihevkiribûn êdî ji bo siyaseta xwe ya Sûriyê wek astengiyek dibînin. Bi taybet Rûsya civîna Astana ne wek zemînek çareseriyê, zemînek astengkirina siyaseta xwe bidest digre. Gotinên wezîrêkarê derve yê Rûs Sergey Lavrov yên derbarê Idlibê ku gotibû "dibe derba kuştinê li komên li Îdlibê bêxistin" ev yek bi zimanekî eşkere raxist ber çavan.

Niha rewş li Sûriyê diguhere. Aktoren ku demkî lihevkiribûn, ji xwe li Sûriyê demdirêj lihevnakin, cihê îttîfaqên tên kirin jî, bi demê re diguhere. Lê rewşek zelal heye ku Rûsya wek garantorê rejîma Sûriyê cihê xwe li Sûriyê diyarkiriye. Di heman demê de ji bo hîlala Şîî biparêze, Îran wek aktorek sereke pişta rejîma Sûriyê digre. Rejîma Sûriyê bi wan aktoran nikare hebûna xwe biparêze. Ji bo wê jî siyaseta her dû dewletan jî li ser siyaseta rejîma Sûriyê bi bandore. Lê di heman demê de Rûsya ji ber têkiliyên xwe yên bi Îsraîlê re, dixwaze Îranê li Sûriyê lewaz bike. Jixwe ji niha ve rewşek wiha li ser herêma Golan despêkiriye. Herêma Golan di encama peymana agirbesta di navbera Îsraîl û Sûriyê ya 1974'an de beşek ji wê ji Îsraîl re hate hiştin. Lê rejîma Sûriyê Golan wek herêmekî hatiye dagirkirinê pênase dikir. Ni bi peymana di navbera Rûs û Îsraîl de ku li ser sînor wê polîsên Rûs bicih bibin, êdî di wateyekî de Golan ji Îsraîl re hate hiştin. Ev siyaseta Rûsya ku hebûna Îsraîl li Golan rewa kir, di encama hêzên Îran ji sînorê Îsraîlê dûrxistinê de pêkhat. Ji aliyekî ve Îsraîl herema dagirkeriye rewa kir, Rûsya jî bi rêya Îsraîl re hebûna Îran li Sûriyê lewaz dike.

Rûsya ku êdî pêwîstiya wê bi hebûna Îranê li Sûriyê nemaye, wek rikberê xwe dibîne, di heman demê de hebûna Îranê ji bo têkîliyên xwe yê bi Dewletên Yekbûyî yên Emerîka re jî bikartîne. DYE eşkere dibêje ku hebûna Îranê li Sûriyê ji bo xwe wek metirsiyek mezin dibîne. Û dixwaze bandora Îranê li Sûriyê tine bike. Ji bo vê jî niha bi him rêya Îsraîl him yekser ketiye nava têkiliyan. Diyar dibe ku Rûsya jî, ji bo hebûna Îranê li Sûriyê ji holê rabe, deriyê bazarê bi DYE re vekiriye. Berî civîna Astana-10 çêbibe, dîktatorê dewleta Tirk ya dagirker Erdogan got ku ew ê di meha Îlonê de bi beşdarbûna Fransa, Almanya û Rûsya civînek li ser Sûriyê li Stenbolê lidarbixin. Herçend heta niha ev gotinên Erdogan ne ji aliyê Rûsya, Almanya û Fransa ve nehatiye pêştrastkirin jî, ger plansaziyek bivî rengî hebe, li vir jî eşkere dibe ku Tirkiyê jî famkiriye êdî wateya civîna Astana nemaye û di bin serweriya xwe de dixwaze gavek nû bide destpêkirin. Lê divê gavê de Îran tineye. Dewleta Tirk ya dagirker ji bo hebûna xwe li Sûriyê bidomîne û destê xwe bi hêz bike, civîna Astana ji bo xwe heta niha bikaranî. Lê dema bikaranîna civîna Astana ji bo dewleta Tirk ya dagirker jî bidawî bû. Ji bo wê civîna dawî ya Astana dewleta Tirk di asta herî nizm de bi hin brokratan beşdarî bû. Ev jî daxuya kirin ku êdî sûka dewleta Tirk li Astana nemaye. Lê dewleta Tirk ji bo dagirkeriya li Sûriyê bidomîne, ji bo ku şerek li ser herêmên dagirkiriye nebe çi jidestê wê tê dike. Îran jî ji bo hebûna xwe li Sûriyê bidomîne û hebûna xwe bihêz bike, divê hevsengiya li ser xwe bide belavkirin. Ji bo wê şerekî li Îdlibê ji bo Îranê zemînek xurt wê ava bike. Jixwe ji niha ve hewldanên Îranê hene. Lê esas bazara li Sûriyê di navbera Rûsya û Emerîka de ye. Herî dawî wezareta parastina Rûsya bi rêya ewle nameyek ji wezareta ewlehiyê ya Emerîka re şandiye. Xuyaye şertê bazarê zelal dibe. Lihevkirina Rûsya û Emerika li ser Sûriyê wê hemû aktorên din bêwate bike. Bi taybet Tirkiyê û Îran. Tirsa her du dewletan jî ew e. Rojên pêş wê rewş hinek din jî zelal bibe…



# Li Efrînê wê çalakî zêde bibin

**Fermandarê giştî yê YPG'ê Sîpan Hemo diyar kir ew amade ne hêzeke xwe bişînin Siwêdayê da ku bajar ji terorê paqij bikin. Hemo her wiha desnîşan kir ku çalakiyên wan ên li Efrînê li dijî leşker û çeteyên dagirker yên Tirkiyê berdewam dikin û got, "Ev çalakî wê zêde bibin."**

Fermandarê giştî yê YPG'ê Sîpan Hemo diyar kir ku ew amade ne hêzeke xwe bişînin Siwêdayê da ku bajêr ji terorê rizgar bike.

Hemo destnîşan kir ku çalakiyên wan ên leşkerî li Efrînê jî li dijî dagirkeriya Tirkiyê û komên çete yên girêdayî wê berdewam in û da zanîn ku ev çalakî bi demê re wê zêdetir bibin.

Çeteyên DAIŞ'ê di 25'ê Tîrmeha borî de êrîşeke hovane bi ser welatiyên Siwêdayê de bir û di encamê de bêtirî 250 welatiyên sivîl şehîd bûn û çeteyan nêzî 40 kes revandin ku piraniya wan jin û zarok in.



Fermandarê Giştî yê Yekîneyên Parastina Gel YPG'ê Sîpan Hemo girêdayî êrîşên li dijî welatiyên Siwêda ji rojnameya Şerq El-Ewsat re axivî û êrîş wek "êrîşeke hovane" bi nav kir. Hemo wiha got: "Êşa welatiyên me yên Durzî heman êşa welatiyên me li Kobanê û Efrînê ye ku niha Efrîn di bin dagirkeriya Tirkiye û komên çete yên girêdayî wê de ye."

Hemo di axaftina xwe de desnîşan kir ku ew amade ne alîkarî bi welatiyên Siwêda re û ji aliyên peywendîdar re pêşkêş bikin û wiha dewam kir: "YPG'ê îspat kir ku di şerê li dijî rêxistina DAIŞ'ê û terorîstan de serkeftî ye. Şervanên YPG'ê di bin sîwana Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê de yek ji sêyan ji giştî rûpîvana welat ji DAIŞ'ê rizgar kiriye."

Girêdayî rewşa li Efrînê Hemo eşkere kir ku çalakiyên YPG'ê yên leşkerî li dijî dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên girêdayî wê li Efrînê berdewam dikin û diyar kir ku ev çalakî wê bi demê re jî bêne zêdekirin.

# Ji bo parastina gel em herdem amade ne




Fermandariya Giştî ya YPG'ê têkildarî komkujiya çeteyên DAIŞ'ê ya 25'ê Tîrmehê ya li ser gelê Suweydayê daxuyaniyek nivîskî parvekir û êrîş şermezar kir.

Fermandariya Giştî ya Yekîneyên Parastina Gel YPG'ê têkildarî komkujiya çeteyên DAIŞ'ê ya 25'ê Tîrmehê li ser gelê Suweyda ku têde 250 kes hatibû qetilkirin daxuyaniyek belav kir û sersaxî ji gelê Dûrzî re xwest û êrîş şermezar kir.

Fermandariyê di daxuyaniya xwe de ev agahî parve kir:

"Di êrîşa DAIŞ'ê ya li dijî gelê Suwêyda ya 25'ê Tîrmehê de zêdetirî 250 kesan jiyana xwe ji dest dan, gelek kes brîndar bûn. Her wiha bi sedan kes ku piraniya wan jin in ji alî DAIŞ'ê ve hatin revandin. Ev komkujiya ku êrîşên întîxarî yên li pey hev û gulebarana bêserûber pêk hat, ji alî me ve bi xemgîniyeke mezin hat dîtin.

Ev êrîş rûyê rast yê DAIŞ'ê careke din raxist holê û pêwîstiya tunekirina vê koma terorî bi awayekî vekirî derxist holê. DAIŞ hîn jî weke tehdîdeke li hember gelê Sûriyê û hemû Rojhilata Navîn hebûna xwe didomîne.

### HER DEM EM AMADE NE

Weke Yekîneyên Parastina Gel (YPG), hewldanên me yên domandina têkoşîna li hember DAIŞ wê ji her demê bêhtir bidome. Weke hêzên parastinê YPG-YPJ, şerê me wê li her dera ku terora DAIŞ'ê lê heye, bidome. Em biryardariya xwe ya parastina gelên Sûriyê ku gelê Durzî jî di nav de careke din diyar dikin û dibêjin ger pêwîstî hebe wê Yekîneyên Parastina Gel li her derê ji bo parastina gel amade be. Ev êrîş di nêrîna me de bi qasî êrîşeke li ser Cizîr û Kobanê giran û biêş e.

Em ji gelê Durzî re sersaxiyê dixwazin, kesên ku di vê komkujiyê de jiyana xwe ji dest dan bibîr tînin."

# Rewşa siyasî hat nirxandin



Rêveberiya Xweseriya Demorkatîk a Kantona Kobanê bi hevkariya TEV-DEM'ê li navçeya Çelebiyê ya Kobanê civînek ji bo nirxandina rewşa siyasî li dar xist.

Rêveberiya Xweseriya Demokratîk û Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM'ê ji bo rewşa siyasî ya dawîn bi gel re binirxîne rêze civîn daye destpêkirin.

Civîna yekem li navçeya Çelebiyê bi amadebûna bi dehan welatiyan hate lidarxistin.

Di civînê de rêveberê TEV-DEM'ê Ayhan Zana axivî û di axaftina xwe de bal kişand li ser tecrîda li ser Rêberê gelê Kurda Abdullah Ocalan. Zana wiha axivî, "Li hemberî şoreşa Rojava şerê taybet tê meşandin, bi serkêşiya dewleta Tirk a dagirker êrîşên hovane li hemberî gelê Kurd û tevahî gelê Bakurê Sûryê, tê kirin.

Ayhan Zana anî ziman ku rêveberiya sivîl û leşkerî ji bo rizgarkirina Efrînê û tevahî Bakurê Sûriyê ji dagirkeran û ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê dixebite.

Endama Koordînasyona Giştî ya Herêma Firatê Bêrîvan Hesen li ser pêşketinên di aliyê rêxistinî de û ev tişt got, "Di çend salên derbasbûyî de û ta niha me gavên mezin di aliyê leşkerî, siyasî û civakî avêtin. Xebatên me li ser bingehê biratiya gelan û jiyana hevbeş tê meşandin. Siyaseta me dûrî berjewendiyên kesayetî ye."…*ANHA*

# Çete ola îslamê li Êzidiyan ferz dikin

Artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê şêniyên Êzidî yên gundê Basûfanê neçar dikin ku zarokên xwe bişînin mizgeftan da ku dersên olê bibînin. Her wiha ji ber ku fermanên çeteyan qebûl nekirin gelek şêniyên gund hatin binçavkirin.

Li gorî çavkaniyeke ji gundê Basûfanê yê navçeya Şêrawa diyar kir ku ketîbeya bi navê Feyleq El-Şam a girêdayî artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê şêniyên Êzidî yên gund neçar dikin ku zarokên xwe bişînin mizgeftan da ku dersên ola îslamê bibînin.

Çavkanî destnîşan kir ku 2 welatiyên gund (A.S. û F.S.) ji ber ku fermana çeteyan qebûl nekir û red kir ku zarokên xwe bişînin mizgeftê, ji aliyê çeteyan ve hatin îşkencekirin.

Çavkaniyekî din ji gundê Kaxirê yê girêdayî navçeya Mabata destnîşan kir ku çeteyên bi navê Ketîbeya El-Hemzat bi sêrkêşiya Ebû Emşa dibistana gund veguherandine dibistaneke leşkerî.




Çavkanî tekez kir ku çeteyan mala welatiyê bi navê Henan Erabo veguherandiye mizgeftê û li wê derê zarokan perwerde dikin. Her wiha çeteyan mala M.K. li aliyê başûrê gund jî rûxand.

Artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê navenda Yekitiya Êzidiyan a Efrînê beriya 2 mehan teqandibûn û peykerê Zerdeşt û hemû pirtûkên girêdayî ola Êzdayetiyê şewitandibûn…*ANHA*

## Aloziya Têkeliyên DYA-Tirkiye -2-



Burhan ERDEM

Heta hilşweşîna welatên li pişt perdeya hesinî, têkeliya Waşîntinê ya bi Tirkiyeyê re xwediya bingeha rêlbergirtina Yekitiya Sovyetan bû. Di Krîza fuzeyên Kubayê de di sala 1962'an de ku Sovyetê çekên nuklerî biribû vêderê, navê Tirkiyeyê gelekî hatibû hilanîn. Lewra Sovyetê ji Amerîkiyan xwestibû ku, fuzeyên xwe yên li Tirkiyeyê rabike. Lê di encamê de, Amerîkî û Rûsan li hevkirin û haya Tirkiyeyê ji naveroka vê hevdîtinê tunebû. Piştî vê Tirkiyeyê xwe li Kibrisê sor kir ku hingê Îsmet Înunu bahsa dagirkirinê kiribû. Rojek ji wan rojên germ, nameyek ji Înunu re hat. Xwediyê nameyê 36. Serokê Amerîkayê Lyndon B. Johnson bû. Di nameya xwe ya 5'ê Hezîrana 1964'an de Johnson ji Înunu re gotibû ku ew dizanin Tirkiye amadekariya îşgala Kibrisê dike û ew vê yekê naxwazin. Eger Tirkiye li gorî daxwaza wan tevnegere, ewê NATO'yê bicivînin. Ev gotin jî dihat wê wateyê ku, wê endametiya Tirkiyeyê ya NATO'yê bihatiba cemidandin û li hemberî Sovyetê wê bi tenê hatiba hiştin. Di vê pêvajoyê de Suleyman Demirel derdikeve ser dikê. Hingê Serokê Partiya AP'ê Ragıp Gumuşpala ku ji xeta Ataturk tê, bi awayekî gumanbar -ku gelek kes dibêjin CIA'yê wî kuştiye- li otela lê dima mirî hatibû dîtin. Li dewsa wî jî Demîrel ê ku li Amerîkayê perwerde dîtibû, hatibû hilbijartin. Bi hatina îktidarê ya hukumeta Demîrel re jî têkeliyên aliyan baştir bû. Piştî vê krîzê jî aloziya herî mezin a di vê têkeliyê de, hatina ser hukum a hukumeta Bulent Ecevît bû. Lewra beriya wî hukumeta darbeyê û piştre jî hukumeta li gorî dilê Amerîkiyan îktidar bû. Amerîkiyan qedexe danîbûn ser hilberîna haşhaşa li Tirkiyeyê ku hatineke mezin a gelê Anadoliya navîn aleqedar dikir. Ecevît ev qedexe rakir û ev krîz bi dageriya Kibrisê gihaşte asteke bilind ku Amerîkayê li hemberî Tirkiyeyê ambargo pêk anîbûn. Piştî vê ambargoyê jî, di wê dema şer sar de Ecevît çûbû Moskovayê û dixwest bi Sovyetan re têkeliyên xwe xurt bike. Ev krîz jî îbret-î alem darbeya 12'ê îlonê berdewam kiribû.

Krîza 3. a mezin jî di dema şerê duwemîn ê kendavê de derketibû. Hingê meclîsa Tirkiyeyê destûr nedabû ku hêzên Amerîkî ji bo êrişkirina Iraqê, erd û ezmanê Tirkiyeyê bikar bîne. Vê krîza dawî her hate rojevê. Lewra wê roja 1'ê adara sala 2003yan darbeya herî mezin a li têkeliyên stratejîk ketibû û hê jî tesîra wê didome. Lewra Amerîkiyan hemû amadekariyên xwe li gorî ku di ser Tirkiyeyê re derbas bibin pêk anîbûn. Lîmanên Mersîn û Îskenderûnê bi malzemeyên leşkerî dagirtibû. Lê belê teskereya dastûrdayina ketina leşkerên Amerîkî ya Tirkiyeyê li meclîsê hatibû redkirin. Amerîkî mecbûr mabûn ku ji başûrê wê bikevin Iraqê û di encamê de, Iraqa Seddam bêyî alîkariya Tirkan hatibû hilweşandin.

Weke tola vê yekê hêzeke ji sûbayên Tirk ku dixwestin li Başûr operasyonekê li dar bixin, bûbûn hedefa Leşkerên Amerîkî. Cihê vê operasyonê bajarê Silêmaniyeyê bû. Li vêderê qerargeheke nîv-eşkere ya artêşa Tirk hebû ku armanca wan êrişên li dijî Kurdan bû. Leşkerên taybet ên Amerîkiyan roja 4'ê tîrmeha 2003'an avêtin ser vê qerargeha Tirkan. Sûbayên payebilind ên Tirk hatin girtin û ji bo bibe îbret-î alem çewal xistin serê van sûbayan û dîmen û fotoyên wan li çapemeniyê belav kirin. Lê piştî vê jî krîza têkeliyan her berdewam kir, ku hefteya pêşiya me emê li ser encamên wê rawestin.